



Message for World Theatre Day 2019

27 March 2019

Kurdish Kurmancî translation

Nameya roja cîhanî ya şano 2019

Karlos Celdran, Kûba

Beriya derketina min li ser dikeya şanogehê, mamosteyên min ên hoste li wir bûn. Wan li ser kevneşopên jiyana xwe wargeh û şêwazeke helbestvanî avakiribûn. Gelek ji wan nayên naskirin yan jî kêr daran tîna bîra me: wan di bêdengiyekê de kardikirin, di aramiya odeyên dûbarekirina lîstokên xwe de û di şanogeha dagirtî de.

Piştî salên xebateke bê hempa, ew hêdî hêdî di van cihan de ji holê hatin rakirin, piştî wînda bûn. Dema ez têghîştim ku çarenûsa min di berdewamkirina rêça wan de ye. Min di heman demê de naskir ku min ji kevneşopiyên wan gelek ezmûne girtiye, jiyankirina di dema niha de bêyî ti hêviyêke din ji bilî gîhaştina zelaliya kêliyên ku ji nûve nayên bidestxistin. Kêliyeke lirasthevhatina bi kesên din re di nava tarîtiya şanogehê de, bêyî ti parastineke din ji bilî rastiya bizavekê, peyvekê ku dide xuya kirin.

Cihê jidayîkbûna şanoya min, ew in van kêliyên rastîhevhatina bi temaşekerên ku êvar bi êvar berê xwe didin şanogehên me ye, ji taxên herî cihêreng ên bajarê min, ji parvekirina hinek seatan bi me re, çend xulekên biçûk. Ji van kêliyên tekane jiyana min diafire, dema ez ji xwebûna xwe, û ji êşkişandina tenê ji bo xwe dûrdikevrim, û dema ez jinûve jidayîkdibim bi naskirina wateya peywira minî şanogerî: jiyankirina rastiya sade ya kêliyên vedimirin, dema tiştên ku mirov dibêje û dike, li bin ronahiya projektoran, resen in û aliyên me yên herî kûr û herî takekesî didin nîşandan. Cihê

jidayîkbûna şanoya min, a min û ya lîstokvanên min, welateke ku ji van keliyan hatiye hûnandin, li vir em xwe ji rûyên sexte û ji tirsê rastiya xwe rizgar dikin, û em di tarîtiyê de didin pey şopa destan.

Keveşopiya şanoyê bi rengê asoyî xwe dide nîşandan. Ti kes nikare tekez bike ku navendeke cihanî ji şanoyê re heye, di ti bajarekî de, an jî di ti avahiyeke taybet de. Şano weke min çawa pêşwazî kiriye, li ser xaknîgariyeke nediyar belavdibe û xwe dispêre jiyana kesên ku wê pratîze dikin. Hunera şanogerî wareke yekbûnê avadike. Her hosteyekî şanoyê keliyên hişmendî û xweşkbûnê yê nayên zarîkirin berve gorê dikşîne, her yek ji wan bi heman rengî tê pişavtin, ti hêzek nikare wan biparêze an mayînde bike. Hosteyên şanoyê vê yekê dizanin, ti teşeyê din ji derveyî vê rastiye ne guncav e, ev jî bingeha karê me ye: afrandina keliyên rastiye, nezalabûnê, hêzê, azadiyê di hembêza lewaziye de. Tiştêk ji wan sax namîne, tenê agahî û tomarkirina wêne an vîdyoyan ên tenê ramanêkê bê çêj li pey xwe dihêlin. Di nava taybetmendiyên van tomarkirinan de, bersivên bêdeng a girseya gelekî dizane ku keli ne dikare were wergerandin ne jî dîtî ji derveyî wê bi xwe, di berçavanre derbaskirina vê rastiya parvekirî ezmûneyeke jiyane ye, çend xulekên zelal mîna jiyane bi xwe.

Dema min naskir ku şano bi xwe welateke, xakeke berferh e, li ba min biryareke weke rizgarbûnê peyda bû: ji cihê ku tu li wir dûrnekeve, ne hêjeyî ye ku tu bazdî an tu cihê xwe biguêrî. Li devera tu heyî girseya gel li wir e. Ew in hevalên ku pêdiviya te bi wan heye. Li wir, derveyî mala te, rastî rojane ya ku nayê derbas kirin tê dîtî. Karkirin li ser vê bêliviya eşkere ji bo rêwîtiya herî mezin a hemûyan pêkan be, em dest bi Odîsê bikin, şopên Argonot: rêwiye neguhêrbar ê ku bê rawestan tundîtî û cidîyeta rastiya cihanê bilez dike. Rêwiya te berve niha, berve keliyê, berve hevdiîna bi hemtayan xwe ve diçe. Rêwiya te berve wan ve diçe, berve dilê wan, berve tekakesayetiya wan ve. Rêwîtiyeke di nava wan de, di nava hestên wan de, di nava bîranînan wan de yê ku hişyar dike û komî ser hev dike.

Rêwîtiya te bahozke hişê mirov tevlihev dike, ti kes dirêjahiya wê nizane û ne jî dikare bêdeng bike. Ti kes nikare pîvana wê ya rast bizanibe. Rêwîtiyeke di nava xeyala gelê te ye, toveke çandî ye li ser xakeke pir dûr: têgihiştina sivîl, sincî, û mirovî ya temaşekerên te ye. Bi vê rengî, ez bê liv im, her tim li mala xwe me, di nava bêxemiyeke aram de, şev û roj kar dikim, ji ber ku raza lezbûnê bi min re ye.

Werger ji zimanê Firensî: Gulistan Sîdo

Koma şano/ Sirya-Qamişlo